

nabada (Girê Beyder)

Girê Beyder li beşê rojava yê sê goşeyê Xabûr li jora Mezopotamyayê li ser riya navbera Dirbêsiyê û Heseke de nêzî dikeve. Gir dûrî Bajarê Heseke dora 30 kmji aliyê bakurê rojava ve û 66 km dûrî bajarê Qamişloyê ji aliyê başûrê rojava ve .

Nabada ji dewletên bajaran yê yekemîn li Sûrî û bakurê Mezopotamyayê pêk hatiya. Girîngiya wê ji cihê wê yê stratîjîk, bicîbûna wê li riya rojhilat a bazirganiya kevin, rola wê ya sereke weke nevendeke çavdêriyê û pêşwazîkirina karwanên rêwiyan di navbera bajarê Xatî û Someran ji aliyekî ve û navbera Bajarê Ferhoniyan û bakurê herêmên Soparto de ji aliyekî din ve; tê

Bajêr ji girekî gilover mîna spêra Troy pêk tê. Li jora gir Akropolek (bajarê bilind, spêr) rûbera wê digihêje 25 hiktaran her wiha ji deşta derdora xwe bi 25 m bilindtir e, û ji bajarekî nizm bi rûberê 2 km pêk tê, ku rûbera bajêr bi giştî bigihêje 120 hiktaran.

Ev bajar di gelek qonaxên cûda re derbasbû ji hezarsala pêncan b.z ta dawiya qonaxa Hêlînistî.

Bajar di nava qonaxên berê de pêşket ta gihîşt asta herî bilîn ji xweşiyê , di destpêka hezarsala sisyan de (2900) b.z. ev bajar hate naskirin bi navê Nabada û weke dewletên bajarî yê biçûk û yê yekemîn ku li bakurê Sûrî û Mezopotamyayê çêbûne; dihate naskirin.

Di vê serdemê de avahiyeke pir mezin ji heriyê ku di nav wê de sera, perestgeh, avahiyên rêveberiyê, nivîsandinên mîxî yê kevintirîn, deqên heriyê û muhran ên ku aliyek ji jiyana civakî, rêveberî û olî ji bajêr re diyarkir. Ev tiştaya rola wê ya girîng di serdema Bronzê ya destpêkê tekez kir. Li gel destpêka hezarsala duyem desthilatdariya Hûriyan xwe berfireh kir li herêmên Xabûr, û di navbera sedsala 17an û 16an de hemû herêm ket bin kontrola wê de, û Nabad ji wan bajaran bû.

Hûrî ji bo nûavakirina Nabad xebitîn û heyîna wan bi piranî li cem seraya barkirî û ji derveyî bajarê nizim bi aliyê rojava de. Gelek avahiyên xwedî dîwarên stûr 80 sm û banên rastkirî hatin dîtin. Her wiha xilik wek guldankek bi serê karikan nexşekirî ye û komek wêneyên li ser wan xilikan mîna wêneyên ajalan (ga û şêr) ku ji bo mijarên nexşekirinê pêk dihatin.

Lêkolîn: ji sala 1992an de lêkolîn di gir de ji aliyê şandeyeke Ewropî-Sûrî hevbeş bi rêveberiya Mark Lebe'au û Entiwan Silêman; dest pê kirin. Şande

gihîşte encamên girîng ku navê bajêr ê kevin û rola wê ya dîrokî li herêmên Xabûr û bakurê Mezopotamyayê; derpêç kir.

Têblêtên Mîxî

Li Nabada 141 tavblêtên Mîxî hatin dîtin ku di binê erda hin odeyan de veşartî bû, her wiha 230 belgeyên nivîskî din hatibûn dîtin. Piraniya wan di malên taybet de hatibûn dîtin û hin ji wan di seraya jorîn de û avahiyên rêveberiyê û ew bi tîpên Somerî û bi zimanê yê kevin ku dîroka wê vedigere dora 2400 salî b.z

Ev nivîsandin û belgeyên wê yê kevntirîn ên ta roja îro li bakurê Mezopotamyayê. Ew têblêt û nivîsandin ji bo armancên rêveberî hatin bikaranîn ku girêdayî tomarkirina sazkarîyên bazirganî yê cîgayî, her wiha tomarkirina beşek ji xwarina belavkirî li ser karkeran, sazkarîyên danê û jimariyariya sewalan. Her wiha deqin Hûrî ku mijarên destaneyan li nivîsî bûn hebûn.

Muhr

Li vî cihî zêdeyî 1500 muhrên stonî bi şêwazên cuda û pir qenc bûn. 85% ji van muhran dîroka wan vedigerin dora 2300 salî b.z û gelek çapên muhran li ser firaq, derî, odeyên depoyan, dergeha perestgehê û eywana padîşahiyê; hatin dîtin

Ev muhr vedigerin malbata cîgayî ya fermî. Mijarên rêveberî yê aborî çareser dike mîna tevgera meşandinê ya çalak li ser riyên bazirganî, dîmenên şer, çalakiyên dîplomasî û hin mijarên têkildarî çalakiyên rojane mîna şahiyên. Guldankek nexşekirî bi serên karikan ku vedigere qonaxa Hûrî Mîtanî.